Sîmfoniya nalînan

Merwan Berekat

Dêwên jînxwar, hovên devbixwîn û çavsor, her û her xwîna dijîtiyê di rehên wan de tîr û reş e, di sernserî dîrokê de, karê wan kuştin, şewtandin, tarûmarkirin, lêdan û jîntarîkirin e.

Li dijî her tiştekî rastin, djî tîn û tîrêjên rojê ne, dijî ala sipî . mirovatiyê ne. Dijminên Kurdan di seranserî dîroka nûjen de, xwestine jîna Kurdan reş û tarî bikin, wê pûç bikin, belkî kaninbin wan tune bikin. Bi sedan gulistsn , bêgul kirin û bi hilma genî ji zikên xwe yên reş asîmanê bajarên Kurdan bi jehir kirin. Her û her xwasteka wan e, ku, Kurdan diyarî gora dîrokê bikin. Dixwazin ,di warê me de wekî çeqelan war -war bikin û li dawiyê jî bibêjin, ev qeder yan jî sûcê çerx û felekê ye. Ya rast dijminên Kurdan bê wijdan in, dilopek ji xwîna mirovatiyê di rehên wan de nîne.

Belê rast e, hemî gel û welatên cihanê bi bûyer in û jiyan bê bûyer na be. Lê bûyerên Kurdan bê sînor in, carina jî, wek wan di seranserî cihanê de nînin. Bûyerên xelkê şahî ne û carina jî êş in. Lê yên Kurdan êş û êş in. Belê yên xelkê agir vemrandine, yên Kurdan agir û şewtandin e, bûyerên gelê cîhanê ken û carina girî ye, lê yên Kurdan girî û girî ye.

Ey cihana bêçav, bêguh, bêziman û bêdeng… Eger zimanê mirovatiyê di şikefta bîrkirinê de aliqiye, yan jî raketiye, lê zanibe ew dawî ye . Vaye roja bi tîn hêdî hêdî tariyê , ji ser eniya xwe hildinaşe, ferhenga tîpan rast dipijiqe û tîpên dadmendiyê li rûyê demê meher dibin û rastî dike cêwî bizê.

Belê, nema bûyerên Kurdan di çalên demçê de tevizî dimînin, ne jî wêne ji rûpelên dîrokê tên dizîn. Bûyerên me di gulistana bîranînên me de payî ne, û wêneyên êş , kul û derdên me, mejiyê me dileqîne , her şev me di xewnê de vediciniqîne. Belê… wêneyên 183 bilbilan ji bilbilên Amedê ji birwaza mejiyê me neketiye, bêna kuzûrî ji bêvilên rojên me derneketî ye. Roj bi roj kaniya tolistînê derdikin.

Belê eger 16425 roj bi demê derbas bûne, lê ew qêrîn û hawara dayîk û bavan , dema bang dikirin wax lawo o o… wax keçê ê ê û hawara zarokan jî ,di nav terafa êgir de dikete guhên dê û bavan, dema digotin: Bavo o o… anê ê ê… keko o o… yadê… amo û xalo, ew sîmfoniya nalînan ta bi îro maye sazê bûyerên Kurdan. Ew yek li wêneyên li ser qaba dîroka Kurdan e, nayê jibîrkirin… na nayê jibîrkirin.

Dumah.k : Ji bo çi...

dike û me dike

- Azmûneke exlaqî û netewî ye: kesê ku xwe bihejmêrê hilgir û tagirê kurdewariyî, pêwîste van wezifeyên xwe bide ber çavên xwe û ji heq wana werê der. Bi kêmanî em aliyê rêzimanî ji wana pêşbixin da ku rêzimaneke hevbeş bê pejirandin

Ev jî bi alîkariya nivîskarên hene dighê armanca xwe, ku, armanca parastina ziman û durustkirina nivîsa kurdî pêk bê